

## Di du heftayên dawîn de li Tirkîyeyê...

### 1ê Tîrmehê, 2022

#### Astengkirina klîba Mabel Matiz ji aliyê Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê ve

Hat ragihandin ku Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê daxwaz kiriye ku vîdyoya ji bo strana "Karakol" a Fatîh Karaca ku bi navê Mabel Matiz tê naskirin, li platformên dijîtal û kanalên muzîkê neyê weşandin.

Di der heq vîdyoyê de li ser medyaya civakî bertekên tund ên dij-LGBTÎ+ hat nişandan û rojnameya Akitê bi nûçeyêke bi sernavê "Mabel Matiz hedê xwe bizanibe! Di klîba skandal de îmaya kirêt!" vîdyoya navborî wekî hedef nîşan da. Li dû van qewimînan Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê ji hemû kanalên muzîkê re talimat şand ku "Wê Vîdyoyê Neweşînin".

Parlamentêrê CHP'ê yê Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) Îlhan Taşci jî diyar kir ku "RTUK'ê ji bo strana dawîn a Mabel Matiz yek bi yek bangî hemû kanalên muzîkê kir û gef li wan xwar ku vîdyoyê neweşînin.

### 3ê Tîrmehê, 2022

#### Jendermeyan gule li wesayîta koçberan reşandin, wan zarokek kuşt

Hat îdiakirin ku li bejahiya navçeya Serayê ya bajarê Wanê mînîbusekê guh nedaye hîşyarîya jendermeyan û ranewestîyaye û li ser vê yekê jendermeyan gule li tekerên mînîbusê reşandine. Di encamê de zarokek 4 salî jiyana xwe ji dest da û 12 kes jî birîndar bûn.

Walîtiya Wanê piştî rojekê der barê bûyerê de daxuyanî da û îdia kir ku ajokarê wesayîtê ber bi personelên jendermeyê ve ajotiye" û "Ji bo ku karibin wesayîtê bisekinînin jendermeyan gule li tekeran reşandine". Di daxuyaniyê de her wiha hat gotin ku "Mixabin koçberêkî ji ber guleyên pengizî jiyana xwe ji dest da û 12 koçberên dernîzam jî bi sivikî birîndar bûn."

Di 5ê Tîrmehê de saziyên sivîl ên di nav de İHD, ÖHD û Komeleya Lêkolîna Koçberiyê ya Serhatê jî hene ji bo lêkolînê bikin çûn Wanê. Şahidên bûyerê îdia kirin ku li cihê bûyerê 50-60 qalîkê guleyan hebûn û piştî ku koçber ji mînîbusê derketin jî gulebarana bi ser koçberan ve berdewam kir. Muxtarê gund Kemal Tosun diyar kir ku di du demên cuda de nêzî 100 gule hatin reşandin û 22 koçber ji wesayîtê peya bûn û reviyen.

## 5ê Tîrmehê, 2022

### Di çalakiya bo şermezarkirina girtina rojnamegeran de 3 rojnameger hatin binçavkirin

Komeleya Rojnamegerên Dicle Firatê (DFGD) û Platforma Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê (MKGP) ji bo 16 hevkarên xwe yê di 18'ê Hezîrana 2022'an de li Amedê hatin girtin, xwestin li Qada Ulusê ya li Enqereyê daxuyaniyê bidin. Di çalakiyê de ku polîsan bi mudaxele yên tund hewl da ku asteng bikin 3 rojnameger hatin binçavkirin.

Nûçegihana Ofîsa Ajansa Mezopotamyayê (MA) ya Enqereyê Denîz Nazlîm û rojnameger Sibel Yûkler û Yıldız Tar dema hatin binçavkirin ji aliyê polîsan ve hatin derbkirin. Her wiha di dema mudaxaleyê de kameraya Eren Guven ê nûçegihanê Ajansa Nûçeyan a Pîrê ji aliyê polîsan ve hat şikandin.

Denîz Nazlîm, Sibel Yûkler û Yıldız Tar ku li Şûbeya Ewlehîyê ya Emnîyeta Enqereyê îfadeya wan hat girtin, danê êvarî hatin berdan.

16 rojnamegerên girtî, di nav 20 rojnameger û 2 xebatkarên buroya rojnameyê de bûn ku di 8'ê Hezîrana 2022'an de li Amedê bi serdegirtina danê sibehê hatibûn binçavkirin.

### Li Zanîngeha Bogazîçiyê astengên li pêşiya merasîma mezûniyetê, betalkirina kartên mezûniyetê

Nacî Încî ku ji aliyê Serokkomar û Serokê Giştî yê AKP'ê Recep Tayyîp Erdogan ve weke rektorê Zanîngeha Bogazîçiyê hat tayînkirin, destûr neda xwendekaran ku ji bo merasîma alternatîf a mezûniyetê kursiyekê saz bikin. Merasîma mezûniyetê ya 155emîn ku 154 sal in li zanîngehê tê lidarxistin ji aliyê Nacî Încî ve hatibû qedexekirin.

Ji bo rêlibergirtina merasîma alternatîf, Alîkarê Rektore Zanîngeha Bogazîçiyê Prof. Dr. Fazıl Önder Sönmez ji hin mezûnên dibistanê re e-mail şand û da zanîn ku ji bo xatirê aramiya zanîngehê' kartên wan ên mezûniyetê ji bo demeke nediyar hatine betalkirin.

Kartên mezûniyetê rê didin mezûnên Boğaziçiyê ku bikevin kampusa zanîngehê. Di destpêka sala 2021'an de hikûmetê bi tayînkirina rektorekî derveyî zanîngehê dest bi midaxele yên rasterast û ên nerasterast li berpêyî Zanîngeha Boğaziçiyê kir. Nerazîbûn û protestoyên xwendekar û akademîsyenan ên li dijî van midaxeleyan, hem li kampûsê û hem jî li qadên din berdewam dikin.

## 6ê Tîrmehê, 2022

### RTUKê çêkirina nûçeyên li ser qetla bijîjk û sekretera/ê polîklînîkê qedexe kir.

Pisporê dil Ekrem Karakaya ku li Nexweşxaneya Bajêr a Konyayê dixebitî û sekretera/ê polîklînîkê ku navê wê/wî nehat vegotin ji aliyê Hacî Mehmet Akçayê xizmê nexweşekê ve bi çek hatin qetilkirin. Hat ragihandin ku êrîşkarê ku li nexweşxaneyêke din wek peywirdarê ewlehîyê yê taybet dixebitî, piştî ku ev cînayet pêk anîne întixar kiriye.

Piştî êrîşê xebatkarên tenduristiyê yê li nexweşxaneyê dixebitîn dev ji karê xwe berdan û muayeneyên xwe yê polîklînîkê rawestandin. Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) ragihand ku ji ber mirina Karakaya dê di navbera 7-8'ê Tîrmehê de xebatkarên tenduristiyê karê xwe rawestînin.

Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) danê êvarê weşana nûçeyên di derbarê qetla pisporê kardiyolojiyê Ekrem Karakaya qedexa kir.

Di van demê dawîn de zêdebûna bûyerên şidet û tundiyê yê li dijî kedkarên tenduristiyê di nav mijarên sereke yê rojevê de cih digirin.

### **RTUK'ê ceza li kanalên mûxalîf barandin**

RTUK'ê careke din cezayê îdarî yê pereyî li Halk TVyê birî, ku cara duyemîn parvekirina serokê yek ji partiyên muxalefetê Kemal Kılıçdaroğlu ya li ser pereyên ku ji Weqfa TURKEN re hatiye veguhastin, weşand.

Kılıçdaroğlu di 25ê Gulana 2022an de li ser hesabê xwe yê Twitterê di daxuyaniya xwe ya bi sernavê "Anatomîya Revê" de îdia kiribû ku Serokomar Erdogan "bi rêya saziyên ku xwe wek weqf nîşan dide gelek pere neqlî derveyî welêt kiriye û amadehîyên revê dike." Wî da zanîn ku Weqfa Ensar a ku li Tirkîyeyê kar dike û bi nêzîkbûna xwe ya bi malbata Erdogan re tê nasîn û Weqfa Xizmeta Ciwanan û Perwerdehiyê ya Tirkîyeyê (TÜRGEV) 1 milyar lîre şandin Weqfa TURKENê ya ku li Amerîkayê hatiye avakirin. Weqfa TURKENê di sala 2015'an de ji aliyê Ensar û TÜRGEVê ve hat avakirin. Weqf di malpera xwe ya fermî de armanca xwe ya damezrandinê wiha rave dike: "Di serî de ji bo cihê mayînê û bûrsan piştgirîdana xwendekarên tirk ên ku tîr Dewletên Yekgirtî yê Amerîkayê û Îngilîstanê". Desteya Rêveber a Weqfa TURKENê hem ji endamên malbata Erdoğan û hem jî ji kesên nêzî malbata Erdoğan pêk tê. Her wiha di belgeya damezrandina weqfê de înzeya kurê Erdogan Bîlal Erdogan jî heye.

Her wiha, ji ber îfadeya "Ezîz" ku parlamenterê HDP'ê Mehmet Ruştu Tiryakî di bernameyekê de ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi kar anîbû, li Halk TVyê cezayê pereyê hat birîn.

Li aliyê din, ji ber Merdan Yanardag di bernameya '18 Deqe' de pirsra "RTUK pereyê ku ji van cezayan bi dest dixê li ku xerc dike" kir, li Tele 1ê ji sînorê jor cezayê pereyê yê îdarî hat birîn.

Cezayên îdarî yê RTUK'ê di navbera ji sedî 2 heta ji sedî 5'ê dahata brut a kanala cezakirî ya meha borî de diguhere.

### **Saziya îlan û Çapemeniyê "prensîbên xwe yê ehlaqî" berfireh kirin, ji aliyê saziyên çapemeniyê yê pîşeyî ve bertek heye**

Saziya Îlan û Çapemeniyê "Esasên Ehlaqî yê Çapemeniyê" ji nû ve saz kir. Sazî herî dawî 28 sal berê di sala 1994'an de ev prensîb dîyar kiribûn. Komeleya Çapemeniyê, Komeleya Rojnamegerên Hemdem, Komeleya Nûçegihanên Dîplomasiyê, DÎSK Basîn-Îş, Komeleya Nûçegihanên Aboriyê, Komeleya Rojnamegeran, Komeleya Rojnamegerên Îzmîrê, KESK Haber-Sen, Komeleya Nûçegihanên Parlemantoyê, Komeleya Rojnamegerên Tirkîyeyê û Sendîkaya Rojnamegerên Tirkîyeyê bi daxuyaniyeke hevpar rêzîknameya nû rexne kir. Rêxistinên çapemeniyê yê pîşeyî wisa îdia dikin ku rêzîkname rayeya sansûreke berfireh ya bi helwesteke keyfî dide Sazîya Îlan û Çapemeniyê û ev sazî dê di nêz de bibe Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) ya hemû medyayên nivîskî û dijîtal.

Rêzîknameya nû çarçoveya "prensîbên ehlaqî" berfireh dike.

Xaleke wiha li rêzîknameyê hat zêdekirin ku di nav prensîbên 1994an de cih negirtibû: "Weşanên ku pesnê sûc û sûcdar didin, an jî gel ber bi kîn û dijminatîyê ve tehrîk dikin nayên kirin." Ji aliyê din ve prensîba "weşana ku terorê teşwîq dike nayê kirin" bi vî rengî hat berfirehkirin: "Agahî û dîmenên di der heq rêxistinên terorê, endamên wan û bûyerên terorê bi awayekî ku van rêxistinan meşru nîşan bidin di weşanan de nabe ku cih bigirin."

Prensîba ku berê wiha hatibû pênasekirin: "Rojnameger, nepeniya çavkaniyên xwe diparêze, nikare razên ku jê re hatine gotin û çavkaniya xwe eşkere bike" bi vî vegotinê hat guherandin: "Rojnameger, nepeniya çavkaniyên xwe diparêze, kes nikare zorê bidê ku razên ku jê re hatine gotin û çavkanîyên xwe eşkere bike."

Di metna nû de prensîba "Dîn nabê bê îstismarkirin" hat guherandin û bû "Dîn û hestên dînî an nirxên ku ji hêla dînî ve pîroz têne qebûl kirin, nabin bîn îstismarkirin û bi xerabî bîn bikaranîn".

Prensîba "Li dijî ehlaqî weşan nayê kirin" hat guherandin û bû "Li dijî ehlaqê giştî weşan nayê kirin"

Du prensîbên nû li metnê hatin zêdekirin: "Bi armanca têkberina avahîya malbatê ku bingeha civakê ye û li dijî parastina malbatê weşan nayê kirin" û "Bi armanca lawazkirina nirxên hevpar ên neteweyî û manewî yên civaka Tirk weşan nayê kirin."

## **7ê Tîrmehê, 2022**

### **Rektoriya Zanîngeha Teknîkî ya Rojhilata Navîn (ODTU) merasîma mezûniyetê betal kir**

Rektoriya METU'yê ragihand ku merasîma mezûniyetê ya ku dê li Stadyuma Devrîmê bihata lidarxistin hat betalkirin. Sedema betalkirinê wiha hat ravekirin: "Li gorî agahîyên ku me wergirtin dê komên cuda ji bo armancên xwe qada me ya merasîmê bikin qada xwepêşandanê".

### **Polîsan êrîşî çalakiya protestoyî ya kedkarên tenduristîyê kirin**

Li Enqere, xebatkarên tenduristîyê ji bo doktor Ekrem Karakaya yê ku di 6'ê Tîrmehê de li Nexweşxaneyê Bajêr a Konyayê hat qetilkirin, bajarên wekî Bolu, Dîlok, Mereş, Mêrdîn, Şîrnex, Trabzon û Wanê jî tê de li gelek herêmên Tirkiyeyê dev ji kar berdan. Kedkarên tenduristîyê li derdora Fakulteya Tipê ya Çapayê ya Stenbolê hatin cem hev û xwestin bi meşê heta Midûriyeta Tenduristîyê ya Parêzgehê şîdeta li ser xebatkarên tenduristîyê protesto bikin û daxwaza xwe ya çalakiyê dubare bikin. Lê belê polîsan bi bombeyên gazê êrîşî xebatkarên tenduristîyê kir û wan xwest meşê asteng bikin. Di vî navberê de xebatkarên tenduristîyê yên di çalakiyê de alîkarîya polîsê ku ji ber gazê xerab ket, kir.

## **11ê Tîrmehê, 2022**

### **Ji AÎHMê Biryara Kavala: Tirkiyê AÎHS binpê kir**

Daîreya Mezin a Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (AÎHM) hikm da ku bi biryara dawîn a derbarê doza Osman Kavala de, xala 46/1 a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (AÎHS) hatiye binpêkirin.

Di 10'ê Kanûna 2019'an de AÎHM'ê bi hinceta ku Tirkiyeyê xala 18'emîn a bi sernavê "Binpêkirina azadiya şexsî" binpê kiriye, biryar da ku Osman Kavala divê bê berdand. Di çarçoveya xala 46/1 a AÎHSê

alîgirên peymanê teahûd kiriye ku riayetî biryarên AÎHM'ê bikin, lê Tirkiye li gorî peymanê tev negerîya û biryara AÎHMê bin pê kir. Dadgehê doz di bergeha pêvajoya bînpêkirinan de ku di 2yê Sibata 2022an de ji aliyê Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ve hatibû destpêkirin, dimeşand. Biryara bînpêkirinê li hember 1 dengî bi 16 dangan hat girtin. Tekane dengê nerazî ji dadwera Tirk a dadgehê Saadet Yuksel hat. Tirkiye dê ji bo lêçûnên dadgehê 7 hezar û 500 Euro bide Kavala.

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê dê nîqaş bikin ka piştî vê biryara îhlalê wê biryareke çawa bê girtin. Derxistina Tirkiyeyê ya ji Meclîsê yan jî rawestandina mafê wê yê dengdanê di nav îhtimalên cezakirinê de ne.

Osman Kavala cara ewil di 1'ê Mijdara 2017'an de bi îdiaya ku rêveber û finansorê çalakîyên Geziyê ye hatibû girtin. Kavala bi "teşebûsa hilweşîna hikûmetê yan jî astengkirina hikûmetê ya pêkanîna erka xwe" (TCK 312) û bi "teşebûsa hilweşandina pergala makezagonî ya bi rêya bikaranîna hêz û şidetê" (TCK 309) hat sûcdarkirin. Di pêvajoya darizandinê de Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (AÎHM) amaje pê kir ku Kavala ji ber hincetên siyasî bêyî gumanên maqûl hatiye binçavkirin û doz lê hatiye vekirin û biryar da ku 'demildest bê berdan'.

Tevî biryara AÎHM'ê Kavala nehat berdan. Amadekirina îdianameyê û pêvajoya darizandinê bi temamî 2 sal û 3 mehan ajot. Di 18ê Sibata 2020an de Kavala ji vê dozê beraet kir, lê bêyî ku were berdan careke din hat tewqîfkirin. Vê carê jî sedema girtinê lêpîrsîna 15'ê Tîrmehê bû; Kavala bi sîxuriyê dihat sûcdarkirin. Di vê navberê de, biryarên beraetê yê Doza Geziyê ku bi îdiayên bêbingeh hatibû vekirin, li ser îtirazê di dadgeha îstînafê de hatin betalkirin û bersûcên ku di nav de Kavala jî heye di 21'ê Gulana 2021'an de dîsa hatin darizandin. Ji vê dozê, bi sûcê "teşebûsa jîholêrakirina hikûmetê" bi hikmê ku di 25'ê Nîsana 2022'an de hat dayîn cezayê muebetê li Kavala hat birîn; Wî ji sûcê sîxuriyê beraet kir.

## 14ê Tîrmehê, 2022

### Konsereke din a Apolas Lermî hat betalkirin.

Konsereke din a hunermendê ji Deryaya Reş Abdurrahman Lermî ku bi navê Apolas Lermî tê naskirin, hat betalkirin. Di 33emîn Festîvala Kadîrgayê ya Deşta Acelleyê ku ji aliyê Şaredariya Akyaziye ve li Sakaryayê tê organîzekirin de, di nav hunermendên ku dê derkevin ser dikê de Lermî jî cih digirt.

Lermî li ser hesabê xwe yê medyaya civakî daxuyanî da û ragihand ku konsera wî ji aliyê şaredarî û rêveberiya komeleyê ve bi hinceta nûçeyên derewîn hatiye betalkirin.

Piştî ku Apolas Lermî di çalakiya ku ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê ve ji bo 19'ê Gulana Roja Ciwan û Sporê hat lidarxistin de derket ser dikê, Serokê Partiya Serkeftinê Ûmît Ozdag û çapemeniya nêzî hikûmetê ew wekî hedef nişanda. Hat îdiakirin ku Lermî li ber ala Pontusê stran gotiye û 19ê Gulana 1919an wekî roja qirkirinê qebûl kiriye. Piştî van nûçeyên ku di çapemeniyê de cih girtin konsera hunermendî ku dê di 29'ê Gulana 2022'an de li Denizliyê bihata lidarxistin ji aliyê Şaredariya Pamukkaleyê ve û konsera Bostanc

iyê ku dê di 11'ê Hezîrana 2022'an de pêk bihata jî ji aliyê organîzasyonê ve hat betalkirin.

**15ê Tîrmehê, 2022**

### **Êrîşa li ser goristana cihûyan**

Li Goristana Haskoyê ya Beyoglu yê 36 kevirên gorên Cihûyan hatin şikandin. Weqfa Serekxamîyê ya Tirkîyeyê li ser hesabê xwe yê fermî yê Twîttêrê li gel wêneyan ev bûyer eşkere kir û bang li Walîtiya Stenbolê û Wezareta Karên Navxweyî kir ku kiryar bînin girtin. Berdevkê Serokomariyê Îbrahîm Kalin li ser vê bangê peyamek parve kir û got ku "Êrîşa hovane şermezar dîkin."

Di daxuyaniya ku ji teref Walîtiya Stenbolê ve hat dayîn de hat diyarkirin ku bûyer di 13ê Tîrmehê, saet 17.00an de pêk hatiye û 81 kevirên goran hatine îmhakirin. Walîtiyê ragihand ku 5 zarokên 11-13 salî êrîş pêk anîne û di encama lêkolîna dîmenên kameraya ewlehiyê de hatine binçavkirin. Zarok piştî îfadeya wan hat girtin radestî malbatên wan hatine kirin. Hat ragihandin ku Walîtiya Stenbolê dê kevirên goran ku di encama êrîşê de şikestîne çêkin. Di vê çarçoveyê de peywirdarên ku hatin goristanê lêkolîn kirin û pîvana kevirên goran ên hatine rûxandin girtin.

### **Polîsan di Roja Pirtûkan a Mûnzûrê de dest danîn ser 2 pirtûkan**

Du pirtûkên Weşanên Dîpnotê û Weşanxaneyê Tekînê di Rojên Pirtûkan ên Mûnzûrê de ku bi hevkarîya Şaredariya Dêrsimê û YAY-KOOP'ê ve hatibû lidarxistin, bi hinceta "biryara berhevkirinê" hatin desteserkirin. 84 weşanxane û gelek nivîskar beşdarî çalakiyê bûn ku di 13'ê Tîrmehê de dest pê kir. Pirtûkên ku ji aliyê polîsan ve hatin desteserkirin ev in: "Tevgera Azadiya Kurdistanê ji Serhildanê ber bi Avakirinê ve" ku bi tevkarîya Ahmet Hamdî Akkaya, Bahar Şîmşek û Joost Jongerden ve hatiye nivîsandin û ji aliyê Weşanên Dîpnotê ve hatiye weşandin û "Qendîleke din" a Atilla Keskin ku ji aliyê Weşanxaneyê Tekînê ve hatiye çapkirin.